



Bernameya xwendinên însanî

KURMANJI

Utbildningsinfo

Skolverket

**Bernameya xwendinên însanî
bernameyeka amedekirinê
ji bo xwendina bilind e û
bidestxistina dîplomeya
amadebûna ji bo xwendina
bilind armanca wê ye.**

Bernameya xwendinên însanî ji te re ye yê ku hez dike di warê zanistên însanî û civaknasiyê de. Ev xwendin ji bo domkirina xwendina madeyên zanistên însanî û civaknasî di perwerdeya bilind de bingehe.

DU PISPORIYÊN CUDA

Kultur

- Tu dê zanyariyan li ser kultur û awayên derbirinê yên hunerî, edebiyat, felsefe û psîkolojiyê werbigirî. Tu dê ji aliyên cuda ve derbirinên kulturî û tecrîbeyên kulturî yên cuda bixwînî û mînaqêşe bikî.

Ziman

- Tu dê zanîna xwe li ser zimanî û hevbendîya di navbera ziman, kultur û civakê de kûrtir bikî. Tu dê zanyariyan li ser qîmeta zimanî û ka çawa zanyariyên zimanî hevûdin xurt dikin werbigirî.

Tiştên ku tu di vê bernamê de fêr dibî

Tu dê li ser mirovî yê di dema kevin û yê di dema niha de bixwînî. Ev tê wê maneyê ku tu dê, li gel hin tiştên din, zanyariyên zêdetir li ser kutlur û mîrasa kulturî, edebiyat, dîrok û felsefeyê werbigirî. Di vê bernamê de ziman giring in û tu dê zanyariyan li ser pirsên navkulturî û li ser hevbendîya di navbera ziman û kulturê de werbigirî. Herweha, tu dê ewlehî û behremendîya xwe ya zimanî ya swêdî, îngilîzî û zimanên din yên ku tu dixwazî bixwînî pêşde bibî ji bona ku tu danûstandin, fikirîn, fêrbûn, anlîzkirin û şirovekirinê bikî.

Bername weha hatiye rêxistin

Madeyên dersê di bernamê xwendinên însanî de madeyên lîseyê yên hevbeş in: îngilîzî, dîrok, werziş û tenduristî, matematîk, zanist, zanyariyên dînî, zanyariyên civakê û zimanê swêdî yan swêdî wek zimanê duyê.

Di bernamê amadekirina ji bo xwendina bilind de, tu kursên teorîk yên zêdetir ji yên bernamê pîşeyî dixwînî.

Madeyên taybetmend yên hevbeş yên bernamê ev in: felsefe, zimanên serdem û zimanê mirovî.

Îmkan heye ku tu di bernameyê de xwe pisportir û zanatir bikî. Ji wê re bernamekûrkolîn (programfördjupning). Ev dikare madeyên wek cografîya, zimanên kevin, matematîk, zimanên serdem, komunikasyona medyayî, perwerdekarî, psîkolojî û civaknasî bin. Ji xwendingehê bipirse ka ew kîjan kursên kûrlêkolînê dide.

Hilbijartina ferdî jî heye ku tu dikarî wê ya ku tu dixwazî bixwînî hilbijêrî. Ji xwendingehê bipirse ka kîjan kurs hene.

Awayên xebatê

Tu dê xwe fêr bikî ku corên cuda yên çavkaniyan bi kar bînî û bi rexneyî hilsengînî. Tu dê ji aliyên cuda ve tevgera mirovî bixwînî û li awayên cuda yên ku mirov pê difikire û derbirînê dike hûr bibî. Tu dê şiyana xwe ya pêşkêşkirina delîlan, jêderxistina encaman û sedemkirina helwêstan pêşde bibî. Tu li ser pirsên exlaqî û felsefeyî bifikirî.

Tu dê şiyana xwe ya hevkarîkirin, dîtina îmkanên cuda û înisyatîvgirtinê pêşde bibî. Tu dê xwe fêr bikî ku tu bi serê xwe kar bikî û berpirsiyariyê werbigirî.

Projeya lîseyê

Tu dê di dawiya Bernameya xwendinên însanî de projeyeka lîseyê amade bikî. Tu dê pîrsekê hazir bikî û karekê mezin yê ku li ser warên zanyarî yên giring yên bernameyê ava dibe plan bikî, pêk bînî û hilsengînî.

Balkişandin

Giring e ku tu xwendina xwe plan bikî heger tu bixwazî şertên taybetî yên xwendineka bilind bi dest bixî. Heger tu bixwazî hêjî bixwînî, li gel rêberekê xwendin û pîşeyê biaxive.

Hergav mafê te heye ku tu di çarçoveya hilbijartina ferdî de kurseka din ya zêde di warê werziş û tenduristiyê de û kurseka hunerê hilbijêrî.